DASTANA MISHEFÊN CERIBANDÎ

Hesen Kaya/ Stenbûl

1

Di bajaran re em bihurîn
Kolanên wan gijbûyî
Daw, daçikandî
Li çaryanan gunehên barîner, gijlok
Bi destê xwe nixumandibû rû
Çaterêyan
Ji bêhna potînên paşayî
Ewran, ji biskên xwe
Poşmanî dadiweşandin
Çarmedor
Xewnên risasî
Kevza tenêtiyê li ser dîwarên ka-
vil

Nikulê keysperestiyê
Li ser xeyalên dawerivî
Zêwa serkeftinê
Mihrîcana mirdan
Tofan
Û qirkirina nûciwanên du nifşan
Bar kirin vî warî
Çivanên gewremizgîniya xewnên avzêrî
Barana hatî
Hemû pelezerê temenî vemaliştin
Di stûyê berşîr û mindalan
Bazbendên penaberiyê
Li ser eniya wan sirgonî. tenî heyvek
Li lênûska alfabeyê
Dilopên keserê, nexwendî
Û kelogiriyek
Li ser pêsîra jinebiyan vezilandî
Şehweta balixiyê
Li ser termê bêkamiyê kokimek
Di hedezaneyê de
Ref bi ref em xesandî
Çiqas hebûn
Peyvên veşartî
Yeko keko
Me ajotin
Ber devê çekên dilmayî

2

Wan çeman
Bi serê serkeftinê sond xwaribûn
Çiyayan
Berbisk û gulçîçek
Bi gurçikên xwe ve dirûtin, sala gonê
Li beramberî cemedê
Wan çiyayan
keçemêr
dînemêr
Serhildêrên zemanî
Di barehgeha dilî
Û
Di berîkên şikeftên herî
Kum û kolos û kulavên kejî de
Sincirandin
Wan rojên bapûkî
Milyonan çav
Legel dil
Tirêja hêza hêviyê
Li ser keskesoran kilîd bûn
Lêv
Li ser nivişta serkeftinê
Lawij
Sirûd
Dîrok
Dawet û şîn

Li demjimêra azadiyê siwar
Bi qudreta kaniya kil
Lêmîşta girnijîna bûkên salî
Tevnê xalîçeya dahatûyê
Nîşan ji kêlika armancê girt

3

Nofek zîpik
destek baran
Bareşek li ser goristanan
Miriyên pak
Ango pakrewan
Lehengên çemê sondxwarî
Pezkoviyên çiyayên çargurçik
Pirtûkên ceribandî
Vediçirînin
Li civîngeha goristanê
Mirî
Zindiyên nawestgehê
Mêvanên Yezdanê gewre
Ango
Derketiyên vê cîhanê
Vediçirînin
Disojin
Di wijdanê qralekî bêwijdan de
Mishefên ceribandî

4

Heçî zarok in
Hechecîk in
Dilopên pak in
Ji eniya Ehrîman
Xeydok
Lerzok
Behitî
Di vê gêjgerînka naletkirî
Ya li ser xaka welatî
Her gav û kêliya sî salên axirî
Zarok
Gulok in
Rîsê xav
Kulîkên xwînî
Dahatûya me ya desteserkirî

5

Li ser
Sûretê xak û zuriyeta min
Tivinga daleqandî, dilmayî
Govend faşibûyî
Bêhna hêmiya genî a salan
Li ser betona zindanan
dûkelîner
Mishefên ceribandî
Awirên zarokan
Tûrek e
Barek e
Zarzarek e
Li ser pişta dayikan

Heçî azadî û

6

Maf û serxwebûn e
Di pêpelûka qesra qirêl de
Hevraz e
Maye
Dûre
Zûrezûre
Kêferate
Lê Bawer bike
Dawiya dawî, felate
Felate
Heçî ev gotin in

Pestgotin in
Di şeveke xedar de
Laş sincirî
Li ber tayê
Bi hişekî nîvronak

7

Heçî pestgotin in
Wekî navê xwe zanim
Li wan nabe sibe
Hemû ewê şikerkevin
Li ber deriyê
Berbangeke çiksayî
Bi çavên felatî